Rwîvî û dihol

Wergêrran ji erebî: Deyka nazelînê

Rojekê ji rojan û li daristanekê ji seyrangehên ciwan, rwîvîyek di nav gul û daran da dijîya. Rojekê rwîvî hest bi biriseka dijwar kir, û çi xwarin bi dest nekefit. Li nêzîk rwîvî amîrên mozîkê hebûn û diholeka mezin jî li wêrê bû. Xudanên tîpê çûbûn xwarin dixwarin.

Piştî demekê kurt bayekê bihêz hat û dihol ya helawîsitî bû. Demê rwîvî dîtî çû nêzîkî darê, wê diholê dibînît, ya ji wîve ya pirrî goşte.

Rwîvî bi ser darê kefit û dest da pwîstê wê û ew dirrand, belê pa demê li nava diholê nêrî, dibînît ku ew jî wekî zikê wî ya valaye.

Herçend e rwîvî yê birisî bû, lê sererayî vê çendê jî ew keyifxoş bû; çunkî wî zanî ku hemî tişt ne bi kelexê mezin û .dengudoreka zêde ye